



Agahî derbarê şeweyê Bervêdanê/ îstînafê li dijî neqebûlkirina vîza-însanî

Îhtîmal e dayina vîza însanî neyê qebûlkin. Eger wilo çêbû, kesên daxwaza vîza însanî kiriye, yan jî mirov û ehlên wan li Swîsre, dikarin di hundir 30 rojan de li cem Daîreya Koçberiyê ya Dewletê (SEM), yan jî li balyozxaneyê Swîsre li dijî qerara nebûlkirinê bervêdanê/ îstînafê bikin.

Dema mirov îstînafê bike, divê mirov pirsên di kaxeta “**kaxeza nedana(refda) Vîza însanî**”, „**Verweigerung eines humanitären Visums**“ de hatine nîşankirin bibersivîne û cewa-ba wan bide. Dema mirov tu îspatên nû ji bo îstînafê nede, yan jî wexta ev îspatên nû xuya nekin, ku xetereke berçav û taybet li ser heyata mirov heye, heye ku îstînaf neyê qebûlkin û refidkin.

1. Şêwe û rêya fermî ji bo îstînafkirinê:

Ji bo mirov bikaribe îstînafê bike, divê mirovên daxwaznameya vîza însanî pêşkêş kiriye biçin **kaxeza nedana(refda)** vîzeyê ji balyozxaneyê wergirin. Ji roja tarîxa mohr kirina biryarê şûn ve **30 roj** li pêş mirov hene ji bo bikaribe îstînafê bike. Bervêdan/îstînaf divê bi **Almanî, Fransî an jî Îtalî** hatibe nivîsandin.

Divê yan îstînaf ji aliyê endamekî malbatê ve li Swîsre yan jî ji aliyê kesê daxwaznameya vîzeyê pêşkêş kiriye hatibe înzekirin.

Îstînaf divê bi rêya **posta nivîsandî (Einschreiben)** li ser vê navnîşanê were şandin an jî mirov dikare kaxezên îstînafê bide balyozxaneyê Swîsreyê :

Einschreiben

Staatssekretariat für Migration
Abteilung Zulassung Aufenthalt
Quellenweg 6
CH-3003 Bern

SEM bi kaxeta piştrastkirina wergirtina îstînafa we re, fatoreyekê bi 200.- Frankên Swîsrî ji bo her dosyayekê dişîne.

2. Naveroka bervêdanê/îstînafê

Li gorî rêbaza (SEM) ê, „Vîza Însanî li gorî benda 4., jêrbend. 2 VEV dikare were dayin, dema li ba kesekî ji ber texmînên aşkere werin bawerkin, ku ev kes li herêm an jî welatê xwe **bi rengekî rasterast, cidî û berbiçav di bin xetera laşe û canê xwe de ye. Kesê te’delêbûyî gerek e di rewşeke taybet û awarte de be, ku destêwerdan û alîkariya hukûmetî jê re lazim e û wergirtina vîza însanî pêwîst dike.** Tiştêkî wilo jî dikare ji encam û netîceya bûyerên nû yên şerekî, yan jî tehdîdeke şexsî û rasterast ji jiyana mirov re çêbibe. Lê helbet lêkolîneke kûr û hayjêheyî ji rewşa kesane re pêwîst û lazim e.



Verein Schweizerisches Rotes Kreuz
Association Croix-Rouge suisse
Associazione Croce Rossa Svizzera

Werkstrasse 18
Postfach
CH-3084 Wabern
Postkonto 30-877-4

Telefon 058 400 4575
info@redcross.ch
www.redcross.ch



Heke mirov berê li welatekî sêyemîn be, bi giştî tê qebûlkirin, ku xeter li ser jiyana wî nema heye.”

Vê qerarê hûn li ser vê girêdanê dibînin:

https://www.bfm.admin.ch/bfm/de/home/publiservice/weisungen-keisschreiben/auslaenderbereich/einreise_in_die_schweiz.html, Weisung: Humanitäres Visum gemäss Art. 4 Abs. 2 VEV“.

Ji ber vê yekê pir girîng e ku **tehdîda şexsî û xetera cidî û mezin li ser laşe û canê mirov** di bervêdanê/îstînafê de baş were xuyakirin. Tena serê xwe rewşa giştî li welatê mirov têr nake. Armanca îstînafê ew e, ku mirov baş xuya bike, **ku kesên vîzeyê dixwazin tehdîdeke rasterast li ser jiyana kesane heye**, yan jî ev kes **di rewşeke însanî ya pir zor û zehmet de ne**. Ji bo vê jî divê xala sereke di îstînafê de rewşa şexsî ya van kesan be û divê ev rewş zelal were nirxandin.

Pirsgirêkên mirov li welat û sedemên xwestina vîza însanî divên bi kitekit werin zelalkirin. Ji lewre pir girîng e tarîx û cih rast werin gotin û zikirandin.

Ji bilî wê jî divê bi temamî were xuyakirin, ku kesên vîze xwastine, kengî û çawa ji welatê xwe derketine.

Heke ev kes **tenê ji bo pêşkêşkirina daxwaznameya vîzeyê, hatibin welatê sêyemîn**, girîng e, mirov di îstînafê de behsa vê yekê bike.

Pir alîkar e, heke belgeyên çîrok û bûyerên hatine gotin, îspat dikin, bi îstînafê re werin şandin. Ev belge divê di derbarê rewşa pirsgirêkên kesane yê şexsê têxwestin de bin. Xaça sor ya Swîsrî (SRK) dikare pêşnûmeya/kaxeta îstînafê bide we. Lê ji ber ku her rewşek ji ya din cuda ye û her malbatek çîrokek wê heye, divê zanyariyên din jî li vê kaxetê werin temam kirin

Ji bo agahiyên zêdetir hûn dikarin têkiliyê bi me re bikin:

miq@redcross.ch

058 400 42 00 (Di-Do 14:00-16:00)

Divê pêşde li ser sozekê were lihevkirin

Schweizerisches Rotes Kreuz
Beratungsdienst humanitäre Visa
Abteilung Soziale Integration und Migration
Werkstrasse 18
Postfach
CH-3084 Wabern

